



Ketina nava Navenda Vaksîna-Koronayê li Lüneburg

## Randevû wergirin, vaksîn lêden

Pêşî, mirovên ji 80 salî mezintir têne vaksînkirin, dût re jî mirovên ji 70 salî mezintir. Navçe ji van komên armanc re dinivîse heke ew dikarin randevûyekê bigirin.

### Qeyidkirin bi tîlefon an înternetê



Bi tîlefonê li **0800 9988665**

Duşem hefta şemî li demjimêr 8ê danê sibê - 8ê danê şevê.



An jî li ser Internetê li ser rûpela:

**[www.impfportal-niedersachsen.de](http://www.impfportal-niedersachsen.de)**


### Vê agahdariyan amade bikin:

- Roja jidayikbûnê û temenê
- Nexweşî an nexweşiyên berê
- Navnîşan
- Salnameya randevûyê

### Lîsteya bendewariyê

Heke randevûyek vala tune, ka em we têxin nav lîsteya bendewariyê. Paşê, gava ku randevûyek vala hebe, hûn ê bi tîlefonê têne agahdar kirin.

# Pirs û Bersiv



## Ma çî tişt pêdivî ye ku ez jibo vaksînlêdanê bînim?

- Belêkirina randevûya-Koronayê
- Kartê nasnameyê, lîsansa ajokariyê an belgeya wêneya fermî ya din

Heke hebe:

- Sertîfîkaya vaksînlêdanê
- Pirsnameya tenduristî û daxuyaniya razîbûnê (tijîkirî)
- belgeya pizîşkî jibo nexweşiyên giran

## Enstîtuya Robert Koch çima vaksînlêdana COVID-19 pêşniyar dike?

Em li seranserê cîhanê bi pandemî ya koronayê ku bi lez belav dibe re rû bi rû dimînin. Nexweşiya COVID-19 dikare bibe sedema nîşanên giran, nemaze di mirovên pîr de û dikare bibe sedema mirinê jî. Bi vaksînlêdanê hûn ê xwe û kesên din diparêzin.

## Ma ez mecbûr im ku ji bo vaksînlêdana pere bidim?

Na, Vaksînlêdana-Koronayê bê pere ye.

## Kengê pêdivî ye ku ez vaksînlêdana duyemîn bikim?

Jibo parastina bi bandor du vaksînan pêdivî ne. Ji ber vê yekê hûn ê du randevûyan bistînin ku bi kêmanî 21 rojan dûrî hev in.

## Ma ez dikarim cem diktorê malbata xwe jî vaksîn lêdem?

Na, Vaksînlêdanên-Koronayê niha tenê ji hêla pizîşkan ve li Navenda vaksîna-Koronayê ya Lüneburg û di tîmên vaksînlêdana gerok de têne pêşkêş kirin. Lê xwe li ser nexweşiyên xweyên berê û vaksînlêdanê bi diktorê xwe re bipeyivin.

## Ez nikarim ji xaniyê xwe derkevim ji ber ku ez pîr nexweş im.

Ji kerema xwe hinekî jî sebir bikin. Heya ku vaksînek nû neyê pesendkirin, ku diktorê we jî bikare vaksîn lêde, hûn ê nikaribin vaksîn lêden.

## Vaksînêdan li Navenda Vaksîna-Koronayê

### bi vî rengî dixebite:

Piştî qeydkirinê hûn ê **erêkirina nivîskî ya randevûyê**

bi postekî an e-nameyê bistînin. Divê hûn vê yekê bi xwe re biben randevûyê.

Ji kerema xwe li wextê xwe de li wir bin. Kesek pê re dikare were.

**Li hîvîyê bûnê, belkî bi qasî saetekê bikşîne.**



### Qeydkirin/ Tomarbûn

Ji kerema xwe heke hûn gihîştin li Navenda Vaksîna-Koronayê de xwe tomar bikin.



### Pirsname

Hûn belgeyên tenduristiya xwe û forma razîbûnê tijî dikin an jî bi tijî kirî û amade bi xwe re bînin.



### Şêwirmendiya dîktor

Heke pêdivî be, hûn dikarin li vir **pirsên vekirî** zelal bikin.



### Vaksînêdan

Heke her tişt baş be, hûn ê tene **vaksînkirin**.



15 hûrdeman

### Bêhnvedan

Hûn ê herî kêm **15 hûrdeman** li bêhnvedanê dimînin. **Xizmetên pizîşkî** jibo we heye.



### Randevûya dûri

Bifikirin li ser **2-an Randevûya vaksînê!**

## Riya Navenda Vaksîna-Koronayê



### Zeppelinstraße, Lüneburg

Bi dûv îşaretan bikevin!  
Park kirin, rast li ber derî




### Hêla 5010

Westgeha: Flugplatz

### Hêla 5100

Westgeha: Lilienthalstraße



Nexşe: LGLN



Rûdank/mask mecbûrî ye li dezgehên Navenda Vaksîna-Koronayê de

[www.landkreis-lueneburg.de/corona](http://www.landkreis-lueneburg.de/corona)



## Navenda Vaksîna-Koronayê li Lüneburgê

Bi vî rengî randevûya vaksînê bigirin

Roj: 26ê Çileyayê 2021-an



Roj: 26ê Çileyayê 2021-an | Wêne: Navçeya Lüneburg, çapemenî û tîkiliyên giştî